
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.


Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 126)* *Sal 21* *Rêbendan 2017 z - 2628 k* *Buha (75)L.S*


# Li Sûriyê ... Hê jî şerê gemar berdewam e

**Desteya sernivîser**

Ev e nêzîkî şeş salan e ku gelê Sûriyê bi kul, derd û xem, di dojeha şerekî dijwar û gemar de dijî… Di vî şerî de, ta niha derdora 500 hezar kesî hatine kuştin, milyonek jî hatine birîndarkirin. Ji bilî rijandina xwîna gel, piştî wêrankirina dehên bajaran û kavilkirina hezarên gund û bajarokan, bêtir ji 12 milyon kesî ji cih û warên bav û bapîrên xwe bar kirine, li biyaniyê penaber bûne, di bin konên serşoriyê de ew toşî hemû reng û cûreyên bê rêzî û têkiliyên ne mirovane bûne, perşîan, xizan û bê rûmet dijîn...Ango mirov dikare bibêje ku welat ser û ber ji welatiyên xwe re bûye dojeh, bûye goristaneke mezin!..

Derbara vê bobelata giran a ku bi ser vî gelî û welatê wî de hatiye, eger bi kurtî be jî, pêwiste em bi hev re li bersiva pirsekê bigerin, ew jî ev e:

Ma gelo kî di ber vî gunehê giran û tewana mezin de berpirsiyar e?!...

Li gora belge û kiryarên li ber dest û çavan, berpirsiyarê sereke yê di ber vê bobelatê de rijêma çavsor a totalîter e, ya ku bi darê zorê, bi zêdegaviyên dezgehên



" Taxa Şêx Meqsod "

ewlehiyê, stoyê gel bada bû, ew ji hemû maf û azadiyan bê par hiştibû, hemû şêweyên girtin, lêdan û eşkencekirinê ........... 2

## Bibîranîna Nemira

Li 31.1.2017an , rêxistin Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Efrînê , bi beşdariya girûpek ji heval,û dostan, û beşdarbûna şandek ji komîta rêvebir, seredana gornên hevalên pakrewan û nemir Kemal Henan (Gundê Tilifê), Mistefa Îso (Gundê feqîra), Ebilrehman Hemadê û hevala Gulistan (Gundê Çolaqa û herweha Nemir parêzer Şewket Nesan jî kir û nemirên azadiyê bi bîr anîn.

Li ser gora hevalê me yê nemir Kemal Henan, …...… 5

## Dîrok û sernavên gundekî...
## Gûndê "Elî bedranê".

Navê gund Elî Bedran e, ji ber ku pîrozgehên du şêxên ku birayên hev bûn (Elî û Bedran) li vî gundî ne pê bi nav bûye. Di vê dawiyê de tîreya (ta'ifa) Elewî ev herdû zîyaretgeh bi xwe girtin, û nîşan dikin ku giwah û belgeyên dîrokî di dest wan de hene ku ev her du ziyaretgeh li tîreya Elewî vedgerin, û di projeya guhertina navên gundan ji hêla hikûmeta



Sûriyê ve di sala 2003 an de navê gund kirne (Bedir). ….6

# Kurd Û Sedsala Bîst Û Yekê

**Şêrwan Berekat**

Eger mirov doza Kurdî di sedsala bîstê de bişopîne û bûyeranên wê raçav bike, herweha cihê wê di nav siyasetên navnetewî de binase ku çawa gelê Kurd û doza wî ya dadwer dibûn qurbaniya berjewendiyên hêz û dewletên mezin, bêguman mirov dê têbigihê ku ta astekê gunehên Kurdan jî di wan têkçûnan de hebûn. Ji aliyekî ve, lawazbûna tevgera Kurdî ya siyasî, rola malbat û êlan di wê tevgerê de, û lihevnekirina wan li ser rêbazên destxistn û serkeftina doza kurdî. Ji aliyekî din ve, diblomasiya kurdî jî di wê demê ne di asta berevaniya doz û mafê gelê Kurd de bû. Ji ber wê jî nikarîbûn têkiliyine xurt û hêzdar bi navendên biryardayînên nevdewletî û dewletên xwedî rol wek Birîtaniya, Firensa, Almaniya, sofyitistan û Emerîka re bikirana. Rast e, ew li qadên şer bi ser diketin, lê li ser maseyên siyasî ew serkeftinan dihatin derdan, û encama wê bobelat, xişim û bêtarên xwînî bi ser gelê Kurd de dihatin, û doza kurdî dihate



paşxistin. Lê dîsa jî gelê Kurd ji riya xebatê venegerî û zincîra şoreşan ji hev qot nebû, û ta roja îro nehatiye rawestandin.

Tucarî sedsala bîstê û ya bîst û yekê di tenga doza Kurdî re, bi şêweyekî ji şêweyan wek hev nabin. Ji tevahiya
.........⓫

---

**Li Sûriyê ... Dûmahîk**

bi hemwelatiyan re bikar anî bû…Lê, piştî ku di navbera rijêm û rikberiyê de dengê tivingê bilind bû, berpirsên dewletên herêmê, her aliyekî ji hêla xwe ve, li gora berjewendiyên xwe, pêçên xwe xistin nava kirîzê, pere bi ser siyasetmedar û şervanan de rijandin, ol û wijdana wan kirîn. Û da ku rivîna vî agirî bilindtir bibe, ter û hişk bişewitîne, gaz li wî agirî kirin, şervan û çete ji her cih û warî civandin, rahênan kirin, bi çek kirin û ew di sînorên Tirkiyê, Urdin û Libnanê re derbasî qada Sûriyê kirin û pilanên xwe yên gemar daxistin meydanê. Her weha, saziya navdewletî jî li gora pîvanên xwe, di ber vê tewanê de berpirsiyar e.

Piştî guftûgoyên di navbera Tirkiyê, Îran û Rûsyayê de, roja Sêşembê 20.12.2016an, danezana Moskoyê hate ragihandin. Li gora wê rêkeftinê, biryar bi rawestana şer li bajarê Helebê û derketina çekdarên rikberiyê ji bajêr berew gundewarê Idlibê hate wergirtin, bi vî awayî, Heleb bi tevayî kete jêr destê rijêmê. Ji ber bandora Tirkiyê û pêywendiyên wê bi hêzên tundrew re, û bandor û têkilyên Îran û Rûsyayê bi rijêma Sûriyê re ji hêlea din ve, ew rêkeftin çû serî, û paşê, biryara rawestandina şer li seranserî Sûriyê hate ragihandin, ew a ku Konseya Ewlehiya Navnetewî biryar bi piştgirya wê wergirt. Di vê çarçewê de hêjayî gotinê ye ku ji bo çespandina agirbestê,van her sê dewletan bi hev re, roja 23-24ê meha çileya borî li Asîtana civînek di navbera şandeke leşkerî ji rikberiya çekdar û yek ji rijêmê li dar xistin, tê de biryara rawestandina şer hate çespandin û komîteyeke sê alî hate damezrandin, û kar û xebat ji bo lidarxistina kongreya Cinêvê, li meha Sibatê dest pê bû.

Eger civaka navnetewî ji dil dixwaze reh û jêderên terora cîhanê ji kokê ve hilke bavêje, pêwiste ku piştî bidawîanîna şerê çekdarî, ew guhdaneke taybet li geşepêdana aborî, çandî, ramyarî û civakî ya welatên hejar bike, rijêmên dîktator û totalîter ku bûne bela serê gelan û mafên mirovan binpê dikin, rê li pêş azadiya gelan teng neke û derfetên kar ji ciwan û jinan re peyda bike, bi zanistî, çanda kuştin û talankirinê ji hişê wan civakan rake, li şûna wê, çanda mirovhezî û pêkvejiyana gel û netewan cîwar bike. Rê li pêş xabata aştiyane û mafê nerîn û derbirînê dûz bike.

# Girêka kar û kurdî-kurdî

**Nûşîn Bêcirmanî**

Bê guman, yek ji nîşanên şaristaniya herî li pêş, diyalog e... Gelek pirobleme û pirsgirêk pê çareser dibin, nakokiyên rengereng bi diyalogê diçin û li şûna wan heyameke aram û zengîn bi nerînên cor be cor peyda dibe.....

Pirsgirêkên nevdewletî, navnetewî, civakî, aborî û hem jî siyasî, bi diyalogê girêkên wan ên kor vedibin û îde çareser dibin. Ji ber wilo milet, dewlet, çarçew, partî û saziyên civakî li seranserî cihanê guftûgoyê bikar anîne , çimku ji çareserkirina giriftarên mezin û biçûk re, diyalog kilîteke pêwîst e.

Bê guman çi diyalogek bibe, mrec û şêwe jê re hene... Li gor zanistiyên ku mirovayetiyê wergirtine li seranserî rêça xwe ya dûr û dirêj :

1- Berî her tuştî yê diyalogvan gerek zanibe ku ew û yê hemberî wî, ne yek raman û boçûn in, ango ji hev ciyawaz in ...

2- Gerek hev qebûl bikin, û zanibin encama guftugoyê wê ne li gora daxwazên wan bi tevayî be, û digel ku ne weke hev diramin, divê ew ji hev re rêzdariyê bigrin. Di heman demê de bi rêzdarî li baweriyên hemberî xwe mêze bikin.

3- Bi armanca lihevkirinê, pêdivî ye xalên hevbeş bibin encamên her diyalogekê, hin ji vî alî û hin ji aliyê din bêne



çespandin.

Em ji bîr nekin ku diyalog bi xwe jî hunereke bilind e, taybetmendiyeke mirovane ye......

Gelê kurd jî, mîna miletên derdora xwe, di sedsaliya nozdehan de, partî , sazî û dezgehên wî hatine damezrandin, nerîn û ramanên ciyawaz jî di gastîna kar û xebata wî ya siyasî û çandî de peyda bûne.... Ev ji hêlekê, ji hêla din ve, jiyaneke hevbeş bi miletên derdora xwe re dijî, desthilatdarên van miletan, bê sînor miletê kurd êşandine û stembarî kirine, par û qedera wî, ji ber wilo jî, bi armanca çareserkirina van rewşên xirab û bidestxistina mafên xwe, hewcedariya miletê kurd bi diyalogê ligel van miletan heye.

Emê li ser diyaloga navxweyî li roj avayê Kurdistanê rawestin, nemaze ya di navbera partî û çarçewên kurdî de. Li Sûryê rawestin....

Hêjayî gotinê ye ku diyalog bi piranî di navbera aliyên ne wek hev de çêdibin, ango ciyawaziyek heye, û ji bo ku di navbera wan de nêzîkbûnek çêbibê, diyalog û hevdîtin divên.

Destpêka diyaloga di navbera partiyên kurdî de sala 1986 bû, di encamê de Hevbendiya Demokrat a Kurd li Sûriyê hate damezrandin , ew ji sê partiyên Kurdî pêk hat ew jî: Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (ELPARTÎ), Partiya Çep a Kurd û Partiya Hevgirtina Gel a Kurd li Sûriyê...Lê, piştî demekê ji xebatê ew hevbendî, ji ber gelek sedeman, ku ya sereke di baweriya min de biryar ne ji hêla van partiyên hevbendiyê dihate dan, bandora hêzên Kurdistanî û herêmê lê hebû û pêşve neçû .

Eger van partiyan bi ciyawaziyê û nerînên rengereng bawerî anîbana, wê karibûna nakokiyên xwe çareser bikirana, ji ber wilo ew ezmûna yekemîn, çarçewa kurdî ya hate avakirin herifî û berdewam nekir.

Diyalog berdewam bû, lê ew encamên balkêş nedan, çi cara ku çarçew an jî dezgehên hevbeş ava dibûn, piştî demeke kin ew sar dibûn, û li dawiyê ew radiwestin, mîna (Hevbendî- Eniya Demokrat- yekîtiya Rêzanî- Encumena Kurdî- Encumena gelê rojavayê Kurdistanê- Desteya Kurdî ya bilind- lêvegera siyasî Kurdî .(.....

Eger mirov li van diyalogên ku bûn, û li çarçew û encamên wê vegere, wê gelek xalên balkêş bibîne:

A- Diyalog hunerek e, li ser zanîn û azadiyê ava dibe, eger diyalogvan ne azad be, ew nikare tu biryaran bistênê. Gelo partî û siyasetmedarên ...... ⓫

# Çareserî li Sûriyê di ``Nenavendiya`` De Ye

Qaziqlî Mihemed



Di pêşî de, weke ku tê zanîn Sûriyê dewleteke pirnetew, ol û bineol e. Sazûmana ku li Sûriyê destlatdar e jî, sazûmaneke navendî, setemkar, zordar, şoven… û yekalî ye. Wê sazûmana yekalî Sûriyê gihand vî deraqî ji tarûmarkirinê. Va ye şeş sal ji kuştinê, penaberbûn û koçberiyê diqedin û hîn jî dawiya wê ne xuya ye. Ji bo dîtina çareseriyekê bi dehan hevdîtin, pilatform û konfirans bi navên (Cinêf 1 2-3, Viyêna, Firansa, Qahîre, Mosko, Siûdiya Erebistanê, Enqere, Himêmîm, Esîtana, Mosko,… hatin lidarxistin, lê ji ber gelek sedemên hundir û derve û nelihevhatina berjewandiyên destêwerdaran, ta vê kêlîkê tu çareserî nehatine dîtin. Di her hevdîtinekê de, gotin û nêrînên curbecur pir dibin, hin bi guman in, hin geşbîn in û hin ji wan jî reşbîn in.


Wek tê dîtin, zincîra hevdîtin û lêgerîna li çareseriyê dirêj û berdewam e, û berjewandiyên Sûriyê û xelkê wê di nav çopilma berjewendiyên hêzên navdewletî û herêmî yên têkar de vegevizin û di nav lingan de bimînin. Eger aliyên Sûrî bi van xalên jêrîn ne bawermend bin, çareseriya siyasî wê bi ser nekeve:

1- Şer kirîzê aloz dike, derman jî tenê di çareseriya siyasî de ye.

2- Sûriyê pirpêkhate ye Kurd, Ereb, Suryan, Keldan û Aşûr, Dirûz, Turkman, Çerkez, Misilman, Mesîhî, Êzdî, Sinî, Elewî… Û H.W.D.

3- Çi çareserî bibe, divê tabloya curerengiya Sûriyê berçav be. Çareseriya siyasî jî bi hevdupejirandin û guftûgoyê dest pê dibe. Di vê warî de, em wek Kurd, weke çawa mafên me hene, weha stubariyên me jî hene. Vêca Tevgera siyasî ya kurdî ji zû ve gotiye û dubare kiriye, ku Gelê Kurd li Sûriyê beşek e ji gelê Sûriya Îro, herêmên kurdî jî (Efrîn, Kobaniyê û Cezîr) beşek in ji welatê Sûrî, weke çawa ew ji aliyê dîrokî û rûniştvanî ve bi Kurdistanê ve girêdayî ne, tevgera siyasî ya kurdî jî pareke serek e ji tevgera niştimanî ya sûrî; weha jî pirsa kurdî ji pirsa Sûriyê ya giştî nayê veqetandin. Îro piştî ewqas xişim û bêtar, ewê ku navendiya hişk a destlatê sersebeb bû, nenavendiya wê jî dermanê çareseriya wê ye. Çimkî weke me berê gotibû, ji alîkî ve Sûriyê pirpêkhate ye, û ji aliyê din ve jî destalata navendî hertim setemkarî û zorê tine holê. Û çiqas silogan, piroje û têrmên siyasî ji aliyê me Kurdan ve werin pêşkêşkirin çareserkirina pirsa me ji çareseriya giştî ya Sûriyê nayê cudakirin; ew bi rengê sîstem û destûra wê ya siberojê-ewên ku ta niha diyar nebûne - ve girêdayî ye, ew diyarbûna jî girêdayî gelek delametan (kurdî, sûrî, herêmî û navdewletî) ye. Ta ku ew piroja giştî -pirsa kurdî jî di nav de- derkeve holê, pir jihevkêş û hatehev -li gorî delametên hikarker- wê çêbibin .Lê li dawiya dawîn, çareseriya ku hêminî û aramiyê li Sûiyê çêbike û nehêle zor û zordarî vegere, sazûmaneke nenavendî ye, wek rêvebiriyên xweser, Federal,…û hwd. Lêbelê çiqas rewş lihevketî be û hikarî jî pir bin, tiştê herî bi bandor ku bi me Kurdan ve girêdayî yekrêziya me ye, û giraniya me ya li ser zemînê ye, bi taybetî jî parastina rêvebiriya ku heye, û Yekîneyên parastina Gel Y.P.G û Y.PJ ne.

# NEWROZa me Û şivantiya 'Elo



**Serdarê Bedirxan**

***" Sal 2008an bû...Weşana NEWROZê hinekî dereng ket, rabû min bi rêya telefonê peywendî bi birêz Kemal Henan ê ku bi navê "Reşo" dinivîsand re kir. Min gilî û gazinên xwe pê kir û jê re got keko çima weşana me di dema xwe de dernakeve, xwendevanên zimanê Kurdî li benda wê ne, bo çi dereng dimîne?...Wî jî kul û derdên xwe ji min re dêran. Rabû min naveroka wê peywendiyê di hejmara 80-Hizêrana sala 2008an de ji xwendevanên rojnameyê re bi navê Serdar Bedirxan weşand.***

***Di çaremîn salvegera pakrewanê giranbuha, Kemal Henan(Reşo) de, ez vê kurtegotarê careke din ji xwendevanên Newrozê re pêşkêş dikim."*** ..(Newafê Bişar)

- Kekê Reşo, ka hejmara me ya dawî ji Newrozê bi ser hev de nehat, ma ne

dema wê nêzîk bûye, xwendevan li benda wê ne?.

- Ho birawo, ho birawo, bawer bike ez ê dev ji vî karî berdim, ez nema

karim…Hê ji wan berhemên ku te ji min re şandine pê ve, tiştek ji min re

nehatiye…Her roj, her şev, ez dengê xwe digihînim wan camêran, ew nivîsên xwe ji min re rênakin…Bi van peyvan, kekê Reşo gotina xwe bi dawî anî.

Ev e ne cara pêşîn bû ku hevalê min Reşo dilsariya xwe ji derengiya rojnameyê aniye zimên, gilî gazinên xwe kirine û gotiye "ez ê dev ji vî karî berdim", lê, her ew bi xebata ziman û çanda gelê xwe ve girêdayî ye, ew nikare jê dûr bikeve, tenê, ew kela dilê xwe bi vê gotinê hênik dike. Gotina hevalê min, çîroka şivantiya Elo anî bîra min, ezê wê ji xwendevanên Newrozê re pêşkêş bikim:

Dibêjin, li devera Botanê, şivanekî qewlek bi gundekî re danî ku ew şivantiya wî gundî bike. Dem derbas bû, qewlê şivên nêzîk dibe, wî ji gundiyan re got: Ev e qewlê min û we nêzîk bûye, bi hêvî me hun ji xwe re şivanekî din bibînin, ji ber ku ez nema li gundê we şivantiyê dikim. Hingî şivan mirovekî dilsoz û qenc bû, guh li pezê gundiyan dikir, baş ew diçêrandin, li ser destê wî pez qebilî û qelew bûbû, destê gundiyan jê nedibû, hema jê re digotin: Em li

şivanekî digerin, ku me dît, oxira te ya xêrê be, lê, di rastiyê de, ew li tu

şivanan ne digeriyan. Roja qewlê şivan bi dawî dibû, bang dikir: Gundîno…!! tu kes pezê xwe bernede, qewlê min qediyaye, ez nema diçime ber pêz, dihate xanîkê xwe, di kulekê re li bênderan temaşe dikir ka gelo wê gundî pez berdin yan na. Gundiyan, pez berdida ser bênderan û vedigeriyan malên xwe karên xwe dikirin, ewî didît ku mih, bizin, kehrik… virde dibezin, wired diçin, ziyanan dikin, hin dikevin nav nîskan, genim, ceh û nehkan… Bi lez û bez wî careke din radihişte darê şivantiyê, bê vîna wî, rojeke nû ji qewlekî nû dest pê dikir..!!

11.07.2008 z

**Bibîranîna … Dûmahîk**

gotinek bi navê partiyê ji aliyê birêz Qaziqlî Mihemed ve hate pêşkêşkirin, tê de wefedariya bi wan pakrewanan re, şopgirtina rêça wan, berdewamiya xebatê, û pêdiviya yekrêzî û danheva mala kurdî -bi taybetî di firka dîrokî ya heye de- hate tekez kirin. Dû re, hevjîna nemir hevala Diya Şiyar spasdariya beşdaran kir, û berdewamiya xebata B.Şiyar di rûyê wan zarokên bi kurdî fêrdibin de dît. Li ser gora mamoste Şewket Nesan jî, birêz Husên Teremûş gotinek kurt kir, tê de rola damezrênerên yekemîn partî da xuyakir, paşê jî lawê nemir birêz Şêrzad sipasiya mîvanan û partiya Yekîtî kir. Bila sere heval, malbat û dostên wan xweş be.



# Dîrok û sernavên gundekî... Gûndê "Elî bedranê".

**Wergêr: Mihemed Zekî Mihemed**




Navê gund Elî Bedran e, ji ber ku pîrozgehên du şêxên ku birayên hev bûn (Elî û Bedran) li vî gundî ne pê bi nav bûye. Di vê dawiyê de tîreya (ta'ifa) Elewî ev herdû zîyaretgeh bi xwe girtin, û nîşan dikin ku giwah û belgeyên dîrokî di dest wan de hene ku ev her du ziyaretgeh li tîreya Elewî vedgerin, û di projeya guhertina navên gundan ji hêla hikûmeta Sûriyê ve di sala 2003 an de navê gund kirne (Bedir).

Cîgehê kargêrî û xaknîgarî: Li gorî dabeşkirina hikûmeta Sûriyê ji hêla rêvebiriyê ve, ew bi Qeza Çil Axa ve girêdayî ye, û dora (25) k.m.an jê dûr e, li gorî hikûmeta kantona Cizîrê bi QezaTirbespiyê ve hatiye girêdan û dora (22)k.m.an jê dûr e.

Sînorên gund yê xaknîgarî ev in: ji hêla başûr ve sînordarê gundê Ereb Şah û Xuşêniyê ye, ji hêla bakur ve sînordarê gundê Şêtika ( (اليمانية)ye, ji hêla rojhilat ve sînordarê gundê Tokil û Eleqosê ye, ji hêla rojava ve sînordarê gundê Maşoq (معشوق)û Babasiyê( (سيناء)ye.

Hozên ku di gund de heyî: hoza (Quling û Şimxalka) ya ku damezirênera gund e, hejmara malên wî dora (50)î malî bû, hin bi hin kêm dibûn ta sala 2011an (30) mal bi tenê mane.

Ol: Şêniyên gund tev misilman in.

Giringtirîn sernavên arkolojî di gund de: Ji hêla rojhilat ve geliyek heye, bi (Hewdê Behdê) tê binavkirin, ji hêla bakur ve (Kaniya Pîvaza) heye ji ber ku li derdora wî bi zehfî pîvaz dihatin çandin, loma jî, weha hatiye binavkirin, û (Kaniya Tehtik) jî heye, ji ber ku av ji navbera du Tehtan (Lat) diherike weha hatiye binavkirin, û (kaniya Elî Bedran) jî heye navê ziyaretgehê wergirtiye, li ser wê kaniyê dareke tûyê heye dîroka wê ya rasteqîn nehatiye naskirin, ji hêla rojava ve çemê ku ji ava wan kaniyên navborî diherike tê re derbas dibe, her werha (Kaniya Qaso) ew jî bi navê yê ku ew kanî kola ye hatiye binavkirin, û (xaka Bîrikê) jî li hêla rojava ye.

- Gitingtirîn xizmetguzariyên ku li gund peyda dibin: Dibistanek di sala (2001)ê de li gund hate avakirin, ji ber ku tîreya Elewî her du ziyaretgeh bi xwe girtin, xizmetguzariya gund kirin û merqedek li ser avakirin û bi refan ji tîreya Elewî serdana wê dikirin, bihîstokên malane û rêyeke qîrkirî jî li gund heye.

Xakên çandinyê: Rûbera xakên çandiniyê dora (7000) donim e, yên ku dewletê diçand (1000) donim e, (2000) donim ên xwediyê gund in, xakên mayî yên ( kirê, cotkar û yê desteserkirî ne).

- Çandinî: Ji kevin de ( Pembû, Birinc, Genim – Ceh – Nok – Nîsk) lê dihatin çandin, lê niha (Kemûn û Gijnij "Kizbera) jî têne çandin, hêjayî gotinê ye ku sedema jinavçûna Birinc ziwabûn bû .

Giringtirîn lawir: Ji kevn de (Ciwanga – Hesp – Hêstir – Çêlek – Pez - Mirîşk û Balinde) xwedî dikirin, niha tenê (Çêlek – Pez – Mirîşk û Balinde), têne xwedî kirin

-Giringtirîn Bûyerên dîrokî: Li gorî jêderên ku ev agahî ji devê wan hatine girtin, tu bûyerên girîng li gund neqewmîne.

*Ji rûpela Çar Çira ya fêsbûkê, ji Erebî hatiye wergerandin.*

# Hin ji derd û êşên me

Dr. M. Zeyno

Di pendên Kurdan de, hin metelok hene, naveroka jiyana gel bi ferehî diyar dikin. Dibêjin (dengî daholê ji dûr de xweş e). Vê gavê ji dûr de xuya dike ku jiyana me li koçberiyê xweş û bedew e. Hin kes dibêjin, em di xêra xwedê de ne, tiştek ji me kêm nîne. Gelo rast e em li van welatên dûriyê di xêr û bereketê de ne?. Ji ser ve, erê rast e. Me pere hene, me tirimbêl heye, zarokên me diçin dibîstan û zanîngehan, me xanî û malên pak hene, di hundir wan malan de her alavên fodil û nû hene, em cil û bergê pak li bejna xwe siwar dikin, her wiha her alavê teknîk û êlêktironîk bi dest me de hene, ava germ û sar û kehrebe bê sînor e û qut nabe, kolanên van welatan dûz û paqij in, her tişt li vir dirust û li dûzan e.

Lê, dîsa jî û her tim dema ku du - sê mirovên Kurd li hev dicivin gilî û gazinên xwe ji hev re dibêjin. Hevoka sereke ew e : Em li welêt bi kêftir bûn. Bilêvkirina vê hevokê re aliyekî jiyanê î veşartî diyar dibe. Ew alî naverok û hinavê mirov derdixe meydanê. Ew her tiştê li ber dest û çavan ên li jor rêz bûne mîna kirasekî li bedena jar û nexweş hatine siwar kirine. Nexwe jiyan tenê bi tirimbêl û telefonên nûjen, bi xanî û malên pak û cil û taqimên nû, bi xarin û vexarina xweş dewam nake. Jiyan ne tenê ew tiştê li ber dest û çava ye. Jiyan her wiha rihetî û aramiya dil û ceger e jî. Jiyan kamil nabe tenê bi çavan û têrbûna zik. Ew kamil dibe demê dil û mejî rihet û têr bin.



Li van welatan têkliyên civakî gelek zirav û sist in, mirov yekûdu nas nake, dibe ku tu bi salan di avahiyekê de bijî û tu navê cîranê xwe nizanibî û tu nizanibî ew çi karî dike, heger hat û cîranekî te silava xwedê li te kir, baş e, heger ne kir û di ber te re derbaz bû kes loman ji kesan nake.

Li van welatan serdana merî û xizman kêm e, bi mehan xizmên hev serdana hev nakin, heger bû jî dibê berî wê bi mehan sozê deynin. Li van welatan mirov bi kar e, valahî tune ye, bajarên van welatan bê rawestan di xebat û lebatê da ne. Dem ji zêr e. Ev nayê wateya ku mirovên van welata ji hev hez nakin. Na ew pir ji hev hez dikin, qedrê hev digirin, û demê hev dibînin rû li ken in. Lê qedrê kar û demê di ser her tiştî re ye. Em jî bi demê re li destar û çerxa jiyana van mirovan tev digerin, ew me wek xwe dikin, ew me tînin ser riya xwe û me dajon xendeka xwe. Bi demê re, em hes dikin ku çûn û hatina me li ba hev kêm bûye, salê carekê an hîn kêmtir em hev dibînin û li hev dicivin. Roja îro hevdîtina xelkê me maye di sê munasebetan de: 1- Dema yek bimire çi li vir û çi li welêt, hin kes di salonekê de rija şîn û behiya miriyê xwe vedikin û hin kes rastî hev tên. 2- Di şahî û zemawendan de hev dibînin, ev jî munasebateke malbatî ye, ku gelek kes lê amede nabin ji ber sedemên kar an jî dûriya cih. 3- Di şahiya Newrozê de yekûdu dibînin. Bala xwe bidiyê bê çiqas em li van welatan hindik rastî hev tên. Heger ev her sê munasebet an hin din mîna wan nebûna, meyê hîn kêmtir hev bidîta. Bi vî awayî têkliyên me ên civakî zirav û tenik dibin, perda civakî qul dibe û ji hev perçe dibe û dirize.

Li gelek bajar û navçeyên komelên Kurdan hene ku mirov dikane li wir hinekî bêhna xwe derxe, lê ew komele bi piraniyên herêm û parçên Kurdistanê ne. Wate, Kurdên her parcakî ji xwe re komelek ava kirine û hev dibînin. Helbet ji ber sedemên civakî, zimanî û ramyarin hemû Kurdên bajarekî nayên ba hev. Em hev fêm nakin. Daxwaz û armancên me ne wek hev in. Her yek bi ser birîna xwe de digirî. Her yek bi derdê xwe de mijûl e. Bi giştî ew komele bi rol û dewra xwe ranabin. Çi maye bi dest me de? Partiyên me mane. Partî wek dezgeh dikane bi rola xwe ya civakî rabe. Lê ew jî ji ber arîşe û derdên civakê dêşin û ew jî mîna komelan herêmî ne. Em bûne qurbanên koçberiyê. Em li van welatan wenda dibin.

# REWŞENBÎR Û AZADIYA JINÊ

**Îlham Osman**

Li ser dika dîrokê, jina kurd roleke girîng lîstiye. Ev rastiyeke ji pêdarî û cangoriya wê ye, ku ji kûraniya dîroka bav û kalan de gihaye me, û bi nirxine giran mijara azadiya jinê aniye holê... Lê mixabin û piştî ewqas serdem, hîn mijara azadiya jinê, di terezoya bêdadî de dileyize.. Bê guman sedema mayîna wê di paş perdeya nezanî, serdayîn û bêdengiyê de pir in, lê pirsa ku xwe ferz dike.. Çima hîn jin bi tirs in?!!! Çima di mijara standina biryeran de hîn li mêr vedigere?!!! Di baweriya me de, mêrên me yên hişk û ezezî astengiyên herî mezin e, hin kevneşûpiyên neyînî jî, ku hîn bandoreke piralî li ser kesayetiya wê dike, û dihêle ku zêdetir tevliheviya ku em tê de dijîn bi bandor be. Lê çîna rewşenbîran jî roleke balkêş di vê mijarê dileyîze, ji ber ku pir rewşenbîrên civaka me bi erka xwe ranabin, ev yeka cihê mixabînê ye, nemaze gava em dibînin ku hin kesayetiyên rewşenbîr stûnên xeyalî li hemberî wê radikin, di dema ku ew xwe weke piştgiriyê azadiya jinê dibînin û didin nasîn, û di her derfetekê de, loman ji nezaniyê dikin û dûrî baweriya xwe diaxifin.. Gelo ma ev ne kambaxî bi xwe ye?!! Firotina gotinên xweşik, qulbandina rastiya ku jin, keç, û xwişka wî tê de dijî?!!! Civaka kurdan ji rewşenbîr û kesên akademî ne bêpar e, lê ew ji



kedên ku jê tên xwestin dûr in.. Gotin, civat û karê ku rewşenbîr bike, tu kes nikare bike, ji ber ku ew bi zanebûn û afrînerê hatiye nasîn.. Lewra divê her kesekî zana, rweşenbîr û xwedî bawernameyên bilind, bi destên jinê bigirin û li hemberî hişên şûnmayî bisekinin, û ji mala xwe de dest pê bikin. Destek bi tenê nade çepikan, ji ber wê divê jin û mêr mala zanînê bi hev re ava bikin, û benê cudatiyê biçirînin, ta ku em jî, ji bo civakeke azad bi pêşketinê re gav bi gav bimeşin..

# Terezû Hêvan E

**Memê Alan**

Dema mirov li pêvajo û afirandina gerdûnê temaşe bike, wê têbighe, ku ew bi xwe û hemî nijad û pêkhateyên wê, li gor sîstemeke pîvayî û hûnandî hatine avakirin, ew sazûman jî sazûmana hevrikî û dijberîbûnê ye. Gozemîn jî ji nav pêkhateyên gerdûnê ye, ew jî weke xeynî xwe bi şêwakî hevrêzkirî û li ser bingeha hevrikbûnê hatiye ristin û hûnandin, çi dema ew terezûya nemîne, gozemîn wê serbinqotî hev bibe, û bobelat û xişim û bêtar wê tê de çêbibin û jiyan jî namîne.Yanê, ger em xwezayê berçav bikin, emê bibînin çiqas agir û av dijberî hev in, ewqas jî di terezûya xwezayê de gerekî hev in. Di vî warî de, şev û roj, germ û serma, reş û sipî, deşt û çiya, gelî û newal, derya û bejayî….û H.W.D. Kînga dûzana yekî ji van hevgerekiyan ji ber hev bikeve, xweza û gozemîn tev de dikeve tehlûke û metirsiyeke mezin. Her weha civak û mirovahî jî weke xwezayê ye, terezûyeke wê heye.Yanê, jin û mêr, zordarî û dadmedî, aştî û şer, pêşketin û şûnketin, hebûn û tunebûn, xizanî û dewlemendî, zayîn û mirin, avakirin û tar û markirin, xêr û şer, kar û zirar, hebûn û tunebûn….û H.W.D, ji bo berdewambûna jiyan û civakê di nakokî û hevrikiyeke berdewam de ne.

Li ser vê bingehê, ger mirov karibe dîroka mirovahiyê bikole û di ber çavan re bibe û bîne, emê bibînin ku, mirov, êl, eşîr, gel û şaristaniyên têvel li hember hev di çopilma van hevrikiyan de, hin têkçûne û hin bi serketine, hin tune bûne û hinan jî berdewam kirine û bi pêş ketine, hinan xizmet şaristaniya mirovahiyê kirine û hinan jî ziyan gihandiyê. Yanê em dikarin bibêjin ên hişmend û dûrbîn zindî mane û berepêş çûne, û yên kurtebîn û tor jî li şûn waran mane. Lê, pêwîst e em bi bîr wînin, ku ne tim ev dijberbûn hevtunekirin e û hew, …….. ⓫

# Hin Şaşiyên Giştî li Cem Hin Nivîskaran – 2 –

Dilovanê Deştê

Di şopandina zimanan de çi devkî û çi nivîskî, hin bêjeyên ku bi şêweyekî şaş têne bikaranîn xuya dibin. Piştguhkirina serastkirina şaşîtiyên wiha lawaziya wan zimanan bi xwe ye. Rast e, şaşîtiyên wiha di axaftina rojane de cih digirin, lê yên di nivîsaran de derbas dibin bandoreke neyînî ye mezin li windabûna zimên bi awakî hêdî hêdî dikin û ziyaneke giran û mezin digihê zimên dema ew şaşîtî di bikaranîna rêzimanê de bin. Hin ji van şaşîtiyan di weşana NEWROZ, hejmar /122/ de hatibû weşandin. Niha jî emê li ser hin şaşîtiyên din rawestin, û şêweyê rast jî li gorî baweriya xwe bidine xuyakirin.

1- Hin nivîskar dema "ê" yan "yê" ji bo destnîşankirina tîpekê yan bêjeyekê bikar tênin, ew van alavên destnîşankirinê dûrî wê tîpê yan bêjeyê dinivîsin. Nimûne: Tîpa "o" yê dengdirêj e. Yan: Hevok bi "girdek" ê destpê dibê. Ya rast û durust ew e ku "ê" û "yê" li pey bêjeya berî xwe, û bê ku valahî hebê, bêne nivîsîn. Herwiha, ew herdu hevok wiha bêne nivîsîn: Tîpa

| | | | |
|---|---|---|---|
| چ = Ç ç | ح = C c | ب = B b | ا = A a |
| ف = F f | إي = Ê ê | أ = E e | د = D d |
| إ - Î î | ـِـ - I i | هـ - H h | گ - G g |
| م = M m | ل = L l | ك = K k | ژ = J j |
| ق = Q q | پ = P p | و = O o | ن = N n |
| ت - T t | ش - Ş ş | س - S s | ر - R r |
| وَ = W w | ڤ = V v | أوو = Û û | ـُـ = U u |
| | . ز - Z z | ي - Y y | خ - X x |

"o"yê dengdirêj e. Hevok bi "girdek"ê destpê dibê.

2- Di hin ferhengên zimanê Kurdî de, jêder şaş têne nivîsîn. Di Ferhenga Destî Kurdî bi Kurdî de, mamoste Umîd Demîrhan jêderên ku bi lêkerên "bûn", "kirin", "hatin" saz dibin wiha dinivîsê: Xweş bûn, xweş kirin, geş bûn, geş kirin, xwîn jê hatin, ... Di Ferhenga Kurdî-Kurdî de, Momaoste Kameran Botî van jêderan wiha dinivîsê: Xweşbûn, xweşkirin, geşbûn, geşkirin, ... Li gor bend û rêzikên rêzimana zimanê Kurdî, jêder bi xwe weke navdêrekê tê bikaranîn û nivîsîn. Ango, ferhengnivîserê birêz Demîrhan jêderên wisa di ferhenga xwe de şaş nivîsîne.

3- Li gorî rêzimana zimanê Kurdî, lêkera "bûn"ê (e, î, im û in) di hevokên navane de, li pey rengdêr, navdêr û cinavan cuda têne nivîsîn. Nimûne: (Gulê qîzeke bedew e. Tu çeleng î. Ew pismamên Serdar in. Yê dixwênê ez im.) Lê mixabin, hin nivîskar vê lêkerê bi dawiya bêjeya berî ve dinivîsin. Nimûne: (Gulê qîzeke bedewe. Tu çelengî. Ew pismamên Serdarin. Yê dixwênê ezim.) Û ev şêweyê bikaranîna lêkera "bûn"ê şêweyekî şaş e.

Em dikarin bi gotinine zelal û awayekî hêsan bêjin, eger (e, î, im û in) li pey rengdêr, navdêr yan cînavê hatin û salixeke wan zelal kir, wê hîngê ew cuda têne nivîsîn; û ew hevok jî (hevoka navane) jê re tê gotin.

4- Carina tevlîhevî di navbera (nêr) û (mê) de pirsgirêkan ji guhdaran re çêdikê, ji ber ku yê axêver wan şaş bikar tênê, nexasim dema ji cemawerekî re daxivê. Pirê caran wê axêver li ser navdêreke mê (dibîstan, berxwedan, ...) baxivê, û di nav axaftinê de wê navdêrê weke nêr destnîşan bikê. Nimûne: (Dibistana gundê me, dibîstankî mezin e. Berxwedana netewî berxwedanekî pir girîng e. Xaka Kurdistanê, xakekî zengîn û dewlemend e.)

Hêvîdar im ku min di vê kurtegotarê de hin şaşîtiyên ku di nivîsandin û axaftinan de bikar tên destnîşan kiribin. Hêvîdar im, herkesê ku ev şaşîtî pê re diborin li pirtûkên rêzimana Kurdî vegerin.

## Birînên Bajarekî Bêdengiya te..

Vejîna Kurd

**Xem û kovanan**
**Bi ser birînên min de diherikîne**
**Hawaran..**
**Li pişta kêlîkine xewar siwar dike.**
**Û çîroka sêwîtiya giyanan**
**Bi hemû zimanan dixwîne.**
**Bajarê xeman!**
**Pêdariya te**
**Hêviyeke henekirî**
**Ji paşela xewneke şîrmij direvîne**
**Rengê henaseyên te**
**Demsalan**
**Ji sînorên demê derdixîne**
**Birînên te**
**Bang li min dikin**
**Ji lêvên sibehan**
**Xunavê hêvî dikin.**
**Erêêê. . Erê bajaro!**
**Tu jî mîna min**
**Ji kenê keskesorê**
**Li pey baranê**
**Mêwên xewnan av didî**
**Bi mûkêşa hêviyan**
**Riyên hatinê dûz dikî**
**Lekeyên êşên demê**
**Û birînên xwetirxwestinê**
**Bi terazoya hevdîtineke xunavî dipîvî.**

# Rojek Berfîn

Zozan Ebdo



Bejna zivistanê ya sar, bi tarîtiya şevê ya qîlereş hatibû xemilandin, heyva gilover di bin porê ewran de hatibû veşartin, lê dîsa jî bi nazikî tîrêjên wê rûyên erdê radimûsandin, stêrk di cihê xwe de mîna karwaneke koçberî dihate xûya kirin... Ev yek ji şevên zivistanê bû, dema ku qebaqên çavên min hevûdu hembêz nedikirin, û ez dibûm mêvanê, Raman, Pirs, Xem û xeyalên dûr .... bayê merxan sawek bi ramanên min re dişand nav rûpelên bê nivîsî, û dihîşt ku ez hîn di pirsa Mirovatî, Aştî, Biratî û pirsa wekheviyê de, hîn dûr biçim û di kolanên bersivan de koçber bimînim... Dîmenê şevê nehat guhartin, lê ew dereng bû, dema ku çirûska çavên min di dergûşa navbera pirs û bersivê de vemirîn... Sibehê ez zû rabûm, agirdanka êzingan bi geşî vêketî bû, hema hema ava li ser di çaydankê de, dê bikeliyaya, çîmen û zozan di bin berfê de razayî bûn, spehiya berfê kêfxweşiyek direvand dilê min, û hestek di hundir min de xurt dikir, ku ez li Kurdistanê, û Efrînê giştî bigerim, û di wa berfê de wê hembêz bikim, lê lîlî û qêrîna cîranan ya tevlehev, çirûska hêviyê, û dawxeza vegerîna Kurdistanê di hundir min de vemirand, û kêfxweşiya min ya mîna zarokatiyê bi xemgîniyek nû wajo kir. Rondikên baranê di çavên min de, pir daxwez kirin, ku bûyerên rabûne xwenek ji şeva borî bûya, lê rastî tucar nayê guhartin, lehengê (25)salî, yê ku bûye nêzî (3)salan e, çavên me li wî neketine, îro berfa spî bi xwîna wî ya sor û paqij xemilî, û mizgîniya pakrewaniya wî hişt ku em vegerin berî daxweza vegerîna Kurdistanê, daxweza vegerîn û xelasa ciwanên me ji desteserî û zîndanên tariyê yên dijmin û neyaran. Di nav goristana pîroz de, û di bin rondikên dayîkan û xunava baranê ya hûrehûre de, giyana "Leheng" hevalên xwe hembêz kir, û bi hev re li benda Kurdistana azad man. Belê pirsên min sêmfoniyek lê dida, û dihîşt ku qêrîna dilê min, bighê nav çiyayê Hawarê, û bi bayê wê re di nav kolanên bersivan de bigere, da ku heya buhara kurdewarî vegere, û kulîlkan bibişkuvîne.

# Ta astekê daxwazên mirov normal in

Nazdar Hesen

Bê guman her mirovek di jiyanê de pir hewldan û têkoşînan dike, daku armanc û daxwazên xwe pêk wer in û destkeftinên mezin bi dest bikeve û bighêje astên bilind, ev jî tiştekî pir baş û normal e, û di hişê her mirovekî de heye, lê kengî ew ji çarçewa xwe ya normal derdikeve ؟؟؟

Dema daxwazên mirov bighêje asta hezkirina xwemalkirinê, ango bixwaze her tişt bi ya wî be, ji bo xwe tenê birame, her dem ji bo berjewendiya xwe ya kesane bixebite, xwe desthilatdar Li ser kesên dî bigire, ta piraniya caran ji bo berjewendiyên xwe destdirêjiyê li ser mafên bilî xwe jî bike, û li serkeftinên wan çavtengiya bibe, tu carî têbînan nepejirîne û xwe bêhemta bibîne; wê demê ew ne tenê ji çarçewa xwe ya normal derdikeve, lê ew berî her tiştî û her kesî ziyanê bi xwe dike û dibe nexweşiyek derûnî, pişt re bandorek neyînî jî li derdora xwe û civakê dike .

Erê ezezî bi hemû cureyên xwe, çi ezeziya tekan e, yan ezeziya partîtî nakeve xizmeta tukesî, lê ew dibe sedema peydakirina kîndarî û dijimantiyê, û belavkirina zilim û zordariyê .

Ji ber ku sedema vê nexweşiyê ya serek e, ji kêmzanînê û perwerdeyek şaş û ne durust tê, lewre jî divê bi awayekî zanistî were nasîn û çaserkirin.

### Girêka kar … Dûmahîk

me hînî vê hunerê bûne?!....Gelek ji wan baweriyê bi nerîna ciyawaz nayînin.....!! Dema berê xwe didine diyalogê , armanca wan ew e ku xalên xwe biser bixin, an wê tu encam û lihevkirinê nebin!.

B- Gelek caran diyaloga Kurdî- Kurdî dest pê nake, ji ber aliyek an jî herdû, mercan didine pêş û wilo ew guftugo nayê li dar xistin û ne jî bi serdikeve.

C – Dema diyalog dest pêdike, em ji xala herî zor û cihê nakokiyê be dest pêdikin.

Mebest ji vê jî ew e, da tu encam ji diyalogê dernekevin, pûç û beravêtî bibe.... Gerek diyalogvan ji xalên hêsan de dest pêbikin, yên tu serêş li dû wan nayê û di pey re hin bi hin çareseriyê ji xalên din re bibînin.

Ç- Xala ku neyê çareserkirin , gerek bo qonaxeke din bê veguhestin û bi demê re hewl bêne dan ku ew jî çareseriyê bibînin.

Ta ku diyalog bi serkeve û meyweyên xwe yên erênî bide, hişmendiyeke bilind û berpirsiyarî, bihneke fereh û dûrbînî tê xwestin....Û her divê em ji bîr nekin ku, berjewendiya gel û pirsa wî di serî de be.

### Terezû … Dûmahîk

na ew hevtewawkirine û berdewamiya jiyanê ye jî, ger mirov zanibe çawa hevdû temam bike û sûdê ji wan dijberiyên jiyan, civak û xwezayê werbigire. Yanê mirov têbighê çawa wê terezûya xwazayî biparêz e. Ji ber ku, ew terezoya meyana berdewamiya jiyaneke xweş û geş, û pêşketina şaristaniya mirovahiyê ye.

Di vî warî de, Kurd(wek miletekî pir ezmûn û ji hezar salan ve xizmet şaristaniyê kiriye), ji ber bandora ol, eşrtî û êlparêztiyême tim xwe weke refê tîtiyan dîtiye, dijmantiya hev kiriye û ketine xefka dijminên kurdayetiyê), divêtiyê em ji van ezmûnên dûr û dirêj sûdê bigirin- bi taybetî di vê rewşa zor nazik ku di ser me re derbas dibe de- hevdû temam bikin û bipejrînin, careke din di çala ku xêrnexwaz ji me re dikolin wernebin, li hember hev rûbirû dernekevin, yekrêziya xwe pêk wînin û xwe bi hêztir bikin, da ku em neyêne tunekirin, weke gelên cîhanê azad û serbest bin, bi gelên cîran re wekhev bijîn, û ji alîkî din ve jî, em karibin xizmet mirovahiyê bikin.

### Kurd Û Sedsala… Dûmahîk

cîhanê, nemaze ji dewletên hêzdar û xwedî biryarên navdewletî re hate naskirin, ku eger doza kurdî netê çareserkirin û gelê Kurd mîna hemû miletan azadiya xwe bi dest nexîne, tucarî aramî, ewlehî û aştî di herêma Rojhilata Navîn de çênabe. Ya din, di sedsala bîst û yekê de, bê Kurdan berjewendiyên dewletên mezin wek ew dixwezin bi cih netên.

Ji wê girîngtit, di vê demê de rewşa gelê Kurd û tevgera wî ya siyasî, bi ya sedsala bîstê re netê pîvan. Îro Kurd xwedî hêzeke leşgerî ne, û hêzeke bi rêxistinkirî ye. Ya din, di warê diblomasî de Kurd ranewestîne, û li seranserî cîhanê hewildanên têkilî û danûstandinê dibin, û ta astekê di vî warî de hin gav hatine avêtin. Rastî ew e, ku di destpêka sadsala bîst û yekê, nemaze di van salên dawî de, ji tevahiya gelên cîhanê û dewletên xwedî hêz û rol re hate nasîn, ku metirsiya Kurdan li ser wan nine, û yên ku dilsozî û bawerî şerê teror û tundrewiyê dikin Kurd in. Ji ber wê jî, ew dibînin gerek e dest ji ber Kurdan bernedin, û ew mîna sedsala bîstê nebin qurbanî û bê maf nemînin.

Yekem car e, ku di dîroka nûjen a Rojhilata Navîn de du dewletên mezin, ku xwedî hêz û rol in Rûsiya û Emerîka, û li rex wan dewletên Ewropî di tenga berjewendiyê xwe re li ser doza kurdî digînin hev, û dixwezin gelê kurd hin ji mafê xwe yê rewa bistînin. Lê divê em ji bîr nekin ku di siyasetê de dilpakbûn ji dilnepakbûnê xerabtir e. Yanê ji mafê me ye, em li dijmin binihêrin ku ew tariyek e û divê em wê rakirin, lê zor pêwîst e, ku em li dostan jî nenihêrin ku ew mîna berfeke spî û di bin wê de çal û xefik nînin. Ji ber ku siyaset ne sinc, sofîtî û pêxembertî ye. Siyaset guhêrbar e, û hertim li gor berjewendiyan riwê xwe diguhêre.

Guman nîne ku rewşa doza kurdî di 2017an de, ne wek a 1917an e. Cinêv ``4`` a 2017an, ne wek Lozana 1923an e. Eger werîsê Lozaneke din li nava doza gelê Kurd were gerandin, bêguman para tevgera siyasî ya kurdî jî wê di wê gunehkariyê de hebe, ji ber ku ta niha lihevkirina xwe, bi kêmasî ji bû nûnertiya Kurdan li kongireyên ku ji bo çareseriya kîrîza Sûrî tên lidarxistin, ava nekirine. Himêmîm û Asîtana nimûne ne. Ev ne dilxwezî û ji tûrikê xeyalan e. Ew rastî û li pêş çavan e.

Sedsala bîst û yekê bi hemû awayan sedsala serkefin û azadiya gelê Kurd e. Belkî ne li gor hêvî û daxwezên me bin, lê tucarî doza kurdî û gelê Kurd bi fîstana sedsala bîstê namînin, û bi paş de venagerin. Ji ber wê jî bang: Divê em Kurd lihev bin.

# Ji Tûrikê Kurdekî

Merwan Berekat

Ew kesên ku di dibistanên nijadperestî û tundrewiyê de hatine perwerdekirin, çendî dengê xwe bilind bikin, û çendî hewil bidin ku lekeyên reş bigînin rastiya gelê Kurd, bila xewnên xwe yên têr teror bipêçin, bikin nivişt û têxin bin balgiyên xwe yên xewê.

Ew kesên ku bi roj û şev bê rawestandin li ber xwe didin, û pêkolên sexteperestiyê dikin, ku gelê Kurd ji mafê wî yê rewa bi dûr bixin, û berê wî bidin xewna hişgiraniyê, bila meraqên xwe yên ji rengê hovîtiya wan, bikin guhar û bi guhên jibîrkirinê xînin.

Ew kesên ku jehra qirkirina Kurdan ji zimanê wan diherike, û bi gilîzê çavsoriya xwe dixwezin siberoja Kurdan bilewitînin, bila li kortika pişt stûyê xwe bigerin, belkî bibînin.

Tevlî ku ew kesan bi lihevnekirin û neyekrêziya tevgera siyasî ya kurdî devqîç in, û bi hemû awayan bi hurhitandina wan mijûl in, bila baş zanibin ku Kurdan di ser pir dîwar û sînorên çêkirî re gav kirine, û ji lukmandinên mezin nema çavgirtî ne.

Pir caran bajarên Kurdan bi hilma xwînê hatine nexişekirin, û sibehên gund û bajarokan bi lorandina dayîkên dilovan payî bûne, lê tucarî nehatiye bîra torînên mirovatiyê ku xwînê bi xwînê bişon, û dîroka xwe bi kujeriyê nav bikin.



Hevsînorên gelê Kurd tev dizanin, ku em ji gewriyên mirovperweriyê der bûne, tev dizanin ku em tenê tovê hezkirin û aştiyê di mejiyê xwe, yê hawîrdora xwe û yê her kesên ku em bi wan re têkêldar in de diçînin.

Vêca, yên ku me nav li wan kiribûn dostên doza gelê Kurd, û mîna ramyarên rastiyê dabûn nasîn, di roj û şevekê de mîna xecûbextan rengê xwe guhartin, hinan Kurd kirin qereçî, hina em kirin solpaqijkar, hinan em kirin koçber û biyanî, û hin jî dema ku em bi destên terorîstan tên kuştin û talankirin, di bin çenkên xwe de dikin vîrqevîrq û bi kuştina me şa dibin.

Ew tev li aliyekî, tiştê ku mirov jê seyr dimîne, lêvên xwe ji gezkirinê birîn dike, û çav maliq dimîn ew e, ku xêrnexwzên gelê Kurd pêkola tunekirina me dikin, û hin ji Kurdan di nav toza wan pêkolan de bi xwe şa dibin…!?

Ji wê seyrtir, ev tiştê ku em dibêjin, ji bilî yên mejîkor tevahiya siyasetmedar, rewşenbîr û yên ku xwe kirin rêberên partiyên kurdî vê yekê dizanin. Lê çima mîna refê tîtiyan rast û çep ji hev diqetin, û her yek li ser hejekî hezhezok vedine, bersiv di çi berîkê de ye, û çima dernakeve, ew cihê pirsa mezin e…!!

Dêpîra min digot: Gundê kêmaqilan neh mal bûn, lê yazedeh axayên wî hebûn, û ji wê xerabtir, eger mirovekî biyan û belkî cawfiroşek ba jî, dihate wî gundî wan li serê xwe dikirin baş ax e…!!!

Bapîrê min bi zaravayê kurmancî yê herêma Efrînê digot: Riya rast, mera digîne daxwaza rast. Porê xelkê serê mera mezin nake. Bermede birayê xwe, winê bibin xudanê gundê xwe.